Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :437 nameronahi@gmail.com 19- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Jiyana koçberan di kampan de zehmet dibe





Li kampa Şehbayê zêdetirî 100 malbat dijîn. Tu rêxistineke navneteweyî serdana vê kampê nekiriye. Rêveberiya kampê zehmetiyan di peydekirina xwarinên zarokan û pêşkêşkirina alîkariya tenduristiyê de dikişîne.

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li kantona Şehbayê di tebaxa 2016'an de li başûrê gundê Keştar ê girêdayî navçeya Şêrawa li başûrê kantona Efrînê, Kampa Şehbayê ava kir.

Beriya êrîşa dewleta Tirk li ser Efrînê hejmarek koçber li kampa Rûbar li rex kampa Şehbayê dijîn. Lê piştî êrîşa dewleta dagirker a Tirk li ser Efrînê pêk hat, koçberên kampa Rûbar neçar man careke din koçberî kampa Şehbayê bibin û vê yekê jî barê kampê girantir kir.

Endamê rêveber ê kampa Şehbayê Mihemed Dîbo wiha got: "Ti rêxistinan heta niha serdana kampê nekirine û alîkarî nedane." Rêveberiya kampê hewl dide tevî kêmderfetan pêdiviyên jiyanê ji zêdetirî 100 malbatan re peyde bike. Di kampê de 110 kon li ser firehiya qadeke 4 hektar hatine danîn.

Li kampê

Şaredariya Gel a Şehbayê û Heyva Sor a Kurd li gor derfetên xwe alîkariyê didin koçberan.

Lê kampê di warê xizmetên tenduristî, kêmderfetî û şîrên zarokan de zehmetî tên kişandin. Koçberên li kampê bang li sazî û rêxistininên mirovî yên navnetewî kirin ku alîkariya wan bikin...*ANHA*



# Hêjîrên Xalo Bazyanê bi nav û denge





Hêjîrên gundê Xalo Bazyanê yê Kerkûkê, yek ji hêjîrên herî xweş û bi tam yên Iraqê ne.

Gundê Xalo Bazyanê dikeve sînorê bajarê Kerkûkê. Salane welatiyên vî gundî bi çandiniya hêjiran re mijûl dibin û salane hêjîrê ji vî gundî li seranserî Iraq û herêmê belav dibe.

Li başûrê Kurdistanê bi taybet jî Silêmanî û Kerkûk di werza havînê de hêjîrên gundê Xalo Bazyanê zêdetir tên xwestin, ji ber tam û şirînahiya wan cihek yê xweyê giring heye.

Welatiyê gundê Xalo Bazyanê Hêmin Elî diyar kir ku hêjîrên gundê wan ji ber tam û şîrîniya xwe nav û dengê xwe heye û got: "Di werza çêbûna hêjîran de bi taybet ji di werza avînan de herî zêdetir xwestek ji bo hêjîrên gundê Xalo Bazyanê çêdibe. Hêjîrê gundê me din vana bajarên Iraq û başûrê Kurdistanê de nav û dengê xwe heye."

Hêmin Elî hêjîrên gundê Xalo Bazyanê ji hêjîrên herêmê din cûda dike wiha got: "sedema serkeke ya şirînî û zerbûna rengê hêjîran, axa gunde ku hêjîrên Xalo Bazyan cûda dike. Salan bi rêjeyek herî zêde hêjîr ji gundê Xelo Bazyanê tê firotin."

Hesen Elî xwediyê baxçeyê hêjîran li gundê Xelo Bazyanê ku di 7 salîde dest bi çêkirina baxçe û bi taybet jî karê hêjîran kiriye û wiha axivî: "Bav û bapîrên me bi karê baxçeyê hêjîran ve emrê xwe derbaskirine, ger li gundê Xalo Bazyanê baxçeyek te yê hêjîran nebe ti wateya wê nîne."

Hesen Elî herî dawî wiha got: "Em hêjîrên xwe herî zêde vedigûhezîn navçeyên Iraqê, Silêmanî û Kerkûkê."...*ROJNEWS*






Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 437 19- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Gêrîla lê da, 7 leşker hatin kuştin



Li bakurê Kurdistanê şerê di navbera hêzên gêrîla û artêşa Tirk a dagirker de mezin dibe. Artêşa Tirk di van şeran de li hember gêrîla windahiyên mezin dide. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragihand ku li Qaqizmana Qersê di çalakiya gerîla de herî kêm 7 leşkerên Tirk hatine kuştin.*R-2*

# HEVALÊN MAM ZEKÎ WÊ TOLA WÎ HILÎNIN

**Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî û Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mam Zekî Şengalî tevahiya temenê da Têkoşîna Azadiya Kurdistanê. Mam Zekî herî dawî jî li çiyayê Şengalê ku di bin gefên qirkirinê de bû ji bo parastina wan xebateke girîng kir. Dewleta Tirk bi paşverûtiya herêmê bi şehîdkirina Mam Zekî Şengalî careke din xwest Îradeya civaka Êzidî bişkîne.**



Koordînasyona Civaka Êzîdî bi daxuyaniyeke nivîskî êrîşa dewleta Tirk a li ser Şengalê şermezar kir û bang li Iraqê kir ku helwesta xwe ya li hember Êzîdiyan zelal bike. Koordînasyonê bang li Neteweyên Yekbûyî kir ku li dijî êrîşên dewleta Tirk bêdeng nemîne û xwest, ku qada hewayî ji balafirên şer ên dagirker re were girtin. Koordînasyonê got, "Em wek rêhevalên Mam Zekî emê tifaq û yekîtiya gelê xwe pêşbixin, xweseriya gelê xwe misoger bikin û tekoşîna xwe bilind bikin." *R-4*

Komîteya Rêveber a PKK'ê jî li ser êrîşa hewayî ya li Şengalê ku dewleta Tirk 15'ê Tebaxê li dijî Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Zekî Şengalî kir, daxuyaniyek da. PKK'ê wiha got, "Kujerên faşîst-qirker ji ber ku şervanekî wiha yê azadiyê kuştine, çiqasî ji wan tê bila kêf xweş bibin. Di demeke gelekî nêz de wê ev kêf û xweşiya wan di ber wan de bimîne. Şagirtên Mam Zekî, milîtanên Apocî yên qewîn wê hesabê ji kujerên faşîst qat bi qat bipirsin." *R-5*

Bi sedan Êzidiyên Efrînê û welatiyên Efrînê bi daxuyaniyekê êrîşa li ser Şengalê şermezar kirin û ji hikumetên Iraq û başûrê Kurdistanê xwestin ku helwesta xwe li hember van êrîşan zelal bikin. Daxuyanî li kampa serdemê ya li gundê Til Sosinê hat dayîn. Di daxuyniyê de wiha hat gotin, "Dewleta Tirk a dagirker dixwaze çand, dîrok û hebûna gelê Êzidî ya bi hezaran salan ji holê rake û tune bike. Zekî Şengalî jiyana xwe di oxira xizmet û parastina çanda civaka Êzidî de feda kir." *R-2*

## MSD bi rûspiyên Ereban re civiya



Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD li Kobanê bi armanca nirxandina hevdîtina bi hêzên rejîma Sûriyê re bi rûspî û şêxên Ereban re civiyan. Endamê Konseya Hevserokatiya MSD'ê Hesen Mihemed Elî di civînê de axivî û diyar kir ku dewletên derve dixwazin fitneyê bixin nava gelên Sûriyê. Mihemed Elî da zanîn ku heta niha di hevdîtinên wan bi rêjîmê re ti lihevkirinek pêk nehatiye. *R-5*

## Têkoşîna me wê li dijî dagirkeriyê dewam bike

Rêxistinên Ciwanên Rojava û Bakurê Sûriyê ku ji bo şermezarkirina êrîşên dewleta Tirk dixwestin derbasî başûrê Kurdistanê bibin, di 24'ê Tîrmehê de li ber deriyê Sêmalka dest bi çalakiyê kiribûn. Ciwanan çalakiya xwe di roja 16'ê Tebaxê de bi daxuyaniyekê bi dawî kirin. Ciwanan dan zanîn ku ewê li dijî dagirkeriyê çalakiyên xwe berdewam bikin. *R-5*



## Armanc Sûriyeke demokratîk û pir-rengî ye



Serokê buroya Partiya Sûriya Pêşerojê li Helebê Mihemed Hac Mustefa diyar kir ku partiya wan ji ber pêwîstiya çareserkirina aloziya Sûriyê hatiye avakirin û da zanîn ku armanca wan avakirina Sûriyeke pir-rengî û demokratîk e. Hac Mustefa got, "Partiya me yekîtî û berjewendiyên gelên Sûriyê esas digire û yekbûna axa Sûriyê diparêze." *R-4*

## Divê li dijî dagirkeriya Tirk bêdeng nemînin



Êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ser başûrê Kurdistanê berdewam dikin. Dewleta dagirker her roj başûrê Kurdistanê bombebaran dike. Nerazîbûnên gelê başûr li hember dagirkeriya Tirk jî zêde dibe. Rojnameger û çalakavanên başûr diyar kirin ku erka wan ew e ku li dijî dagirkeriyê bêdeng nemînin. *R-2*

## Li Serêkaniyê 104 Şehîd hatin bibîranîn



Li Serêkaniyê şehîdên ku di mehên Gulan, Hezîran, Tîrmeh û Tebaxê yên salên cuda de li Bakurê Sûriyê û Rojava şehîd ketin, bi merasîmekê hatin bîranîn. Li ser navê Meclîsa Malbatên Şehîdan Şêrîn Şêxê axivî, sersaxî ji malbatên şehîdarnre xwest û got: "Ev ax bi xwîna şehîdan hatiye avdan. Em ê keda şehîdan ji bîr nekin û li ser rêya wan bimeşin."

## Iraqê êrîşa li ser Şengalê şemezar kir

*R-2*

# Bila Iraq û başûr helwestên xwe zelal bikin

***Bi sedan Êzidiyên Efrînê û şêniyên Efrînê bi daxuyaniyekê êrîşa li ser Şengalê şermezar kirin û ji hikumetên Iraq û başûrê Kurdistanê xwestin ku helwesta xwe li hember van êrîşan zelal bikin. Daxuyanî li kampa serdemê ya li gundê Til Sosinê hat dayîn. Hat gotin ku Zekî Şengalî jiyana xwe di oxira xizmeta Êzidî de feda kir.***



Yekitiya Êzidiyan a Efrînê hedefgirtina Mam Zekî Şengalî şermezar kir û ji hikumeta Iraqê û ya Başûrê Kurdistanê xwest ku helwesta xwe derbarê vê êrîşê de zelal bikin.
Bi sedan Êzidiyên Efrînê û şêniyên Efrînê ku li Kampa Serdemê ya li gundê Til Sosîn kom bûn û bi daxuyaniyekê êrîşa balafirên dewleta Tirk a dagirker li ser Şengalê û hedefgirtina Zekî Şengalî şermezar kirin. Daxuyanî bi zimanê Erebî û Kurdî hate xwendin.
Di daxuyaniyê de bi navê Yekitiya Êzidiyan li Efrînê êrîşa Erdogan a li dijî axa Şengalê hate şermezarkirin. Yekitiya Êzidiyan diyar kir piştî destwerdana Yekîneyên Parastina Gel, gelê Êzidî ji qirkirina DAIŞ`ê hate xelaskirin û DAIŞ li Şengalê tune bû û wiha hate gotin: ″Lê sultanê Osmanî Erdogan bi balafiran êrîşî axa Şengalê ya birîndar kir û cihên pîroz ên Êzidiyan rûxandin, da ku hebûna Kurdan a bi hezaran salan ji holê rake.″
Yekitiya Êzidiyan di berdewama daxuyaniyê de anî ziman ku hedefgirtina Zekî Şengalî hedefgirtina sembola berxwedana Şengalê ye û wiha dewam kir: ″Şehîd Zekî jiyana xwe di oxira xizmeta gelê xwe û doza civaka Êzidî de feda kir.″
Yekitiya Êzidiyan a Efrînê ji hikumeta Iraqê û hikumeta Herêma Başûrê Kurdistanê xwest ku helwesta xwe derbarê vê êrîşa li ser civaka Êzidî de zelal bikin.

## Gêrîla lê da, 7 leşker hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragihand ku li Qaqizmanê di çalakiya gerîla de herî kêm 7 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand û ev agahî da: Artêşa TC a dagirker 13'ê Tebaxê li herêma Kizil Kîlîse ya li navçeya Qaqizman a Qersê dest bi operasyonê kirin. Sibeha 14'ê Tebaxê balafirên şer û helîkopterên kobra yên hêzên dagirker bi rengekî bê navber bombe li herêma Hîslî Magara barandin. 2 yekîneyên operasyonê piştî bomberdûmanê hewl dan ji bejahî ve xwe bigihînin herêma Kevirê Qul. Di çarçvoeya Pêngava Serketinê ya Şoreşgerî de ku li Eyaleta Serhedê dest pê kir, hêzên me danê nîvro li her du yekîneyên dijmin xistin. Ji nêz ve bi du baskan derbên giran li yekîneyên dijmin hatin xistin û bi qasî ku hate tespîtkirin 7 leşkerên dijmin hatin kuştin, gelek leşker jî birîndar bûn. Hevalê me Şervan ku bi rengekî fedayî li dijî dijmin şer kir, şehîd bû.
6'ê Tebaxê yekîneyeke me dema ku li herêma Deştê ya navçeya Qisle ya Dersimê bi erka xwe radibû, li hêzên dijmin rast hat û şer derket. Di şer de gelek leşkerên dijmin hatin kuştin. Hevalekî me yê di vî şerî de li lehengî li ber xwe da şehîd bû."

## MLKP/Rojava: Bi êrîşan dixwazin Kurdan bê vîn bihêlin



MLKP/Rojava, Zekî Şengalî bibîr anî û bal kişand li ser berpirsyariya Erdogan a bûyerê û got, "Dewleta Tirk a di nav qeyranê de diperpite, ji bo hêrsa kedkarên kom bûyî belav bike, êrîş dibe ser hêzên pêşengiya raperînan dikin.'
MLKP/Rojava, Endamê koordînasyona Êzîdiyan Zekî Şengalî ku di êrîşa dewleta Tirk a dagirker de şehîd bibû, bi daxuyaniyekê bibîr anî.
Di daxuyaniyê de hate diyar kirin ku berpirsyarê êrîşê Tayîp Erdogan e û wiha hat gotin: "Dewleta Tirk a dagirker û desthilatên paşverû, naxwazin gelê Kurd, civaka Êzîdî bibin xwedî vîn, xwe bi xwe bi rê ve bibin. Ji bo wê êrîşên tunekirinê li ser gelê Kurd dimeşînin. Li Dersimê qetilkirina Atakan Mahîran, li şengalê ya Mam Zekiyan encamê vê polîtîkayê ye. Dewleta faşîst dixwaze pêşnegên gel qetil bike û gel bê rêxistin û bê vîn bihêle. Bi vî awayî gel radest bigire."
Di daxuyaniyê de hat gotin, "Em bawer dikin ku di bin rêberiya têkoşîna wan a birûmet de em ê teqez bigihijin serkeftinê."

## Divê li dijî dagirkeriya Tirk bêdeng nemînin



Rojnameger û çalakvanên başûrê Kurdistanê diyar kirin ku erka wan ewe li dijî dagirkeriyê bêdeng nemînin û gel li dijî dagirkeriyê hişyar bikin.
Êrîş û bombebaranên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê bi hemû awayî berdewam dikin û nerazîbûnên li dijî êrîşan jî berfireh dibin.
Rojnameger Jino Mihemed diyar kir ku metirsî netenê êrîş û bombebaranên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê, metirsiya mezin ewe ku bi nermî Başûrê Kurdistanê dagir kiriye."
Jino Mihemed bang li xelkê Kurdistanê û rêxistinên civaka navneteweyî kir ku li dijî dagirkeriya tirk ya li ser başûr derkevin.
Rojnameger Umêd Heme Salih jî diyar kir ku erka wan ewe ku li dijî dagirkeriyeê bêdeng nemînin û got; "Erka me ewe ku em bi hemû hêza xwe li hemberî dagirkeriyê civakê hişyar bikin. Ji ber ku heta ku xelk bêdeng be, wê dagirkerî û êrîş zêdetir bibin."
Aktîvîstê civaka sivîl Yequb Kakik eşkere kir ku divê xelk li dijî dagirkeriyê bibe xwedî helwest û wiha axivî; "Divê li dijî dagirkeriyê helwest hebe. Di nava desthilat û hizban de gendeliyekî mezin heye. Ev ji bûye sedem ku welatên derdor destdirêjiya başûrê Kurdistanê bikin."
Yequb Kakik diyar kir ku divê gel li dijî dagirkeriyê rabe û bêdeng nemîne…***ROJNEWS***

## Iraqê êrîşa li ser Şengalê şemezar kir




Wezareta Derve ya Iraqê êrîşa balafirên şer ên dewleta Tirk a dagirker li ser Şengalê şermezar kir û careke din xwest ku dewleta Tirk ji axa Iraqê derkeve.
Roja 15'ê Tebaxê balafirên dewleta Tirk a dagirker li Şengalê Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Zekî Şengalî hedef girt û di encamê de Şengalî şehîd bû.
Têkildarî mijarê, berdevkê Wezareta Derve ya Iraqê Ehmed Mecûb daxuyaniyek da û ev tişt got: ″Wezareta Derve ya Iraqê êrîşên hewayî yên Tirkiyê li ser herêmên Şengalê şermezar dike.″
Wezareta Derve ya Iraqê diyar kir ku derbarê êrîşa li ser Şengalê de tu têkilî di navbera Bexda û Enqereyê de çênebûye.
Her wiha Wezareta Iraqê careke din xwest ku Tirkiye hêzên xwe ji axa Iraqê derxe, ji ber ku ev yek ne li gorî hevpeymanên navneteweyî ye.

## Li kampeke koçberan 33 zarok mirin

Li kampeke koçberan a li bakurê rojhilatê Nîjeryayê hatibû çêkirin, di nava du hefteyan de 33 zarok ji ber mercên xirab ên jiyanî jiyana xwe ji dest dan.
Dixtorên Sînor Nenas (MSF) anî ziman ku kesên jiyana xwe ji dest dane li kampa koçberan a li bajarê Bamayê ne. Li gorî daxuyaniya MSF, "Piraniya zarokên ku hatibûn mir pir xirabû bûn. Ji ber nebûna derman û mercên giran ên jiyanê li kampan rewşa wan hê xirabtir bûn."
Li gorî MSF'ê, di nava 2-15'ê Tebaxê de li kampê 33 zarok mirine.
Nûnera rêxistinê ya li Prasînê Lîsa Veran got: "Ji ber mecên xirab ên jiyanê mirine."
Bama, beriya niha bajarê duyemê herî mezin ê eyaleta Bornoyê bû, vegerandin navenda alîkariya mirovî.
Welatiyên ji ber hovîtiya Boko Haram direvin li van kampan tên bicihkirin. MSF diyar kir ku ji meha Nîsana 2018'an û vir ve nêzî 10 hezar kes li Bamayê bicih bûne.
Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: "Li gorî alîkariya têkirin, tevî her roj hejmara welatiyan zêde dibe, lê weke xwe dimîne. Kampa ku herî zêde dikare 25 hezar kesî bi cih bike, ji meha Tîrmehê ve rêjeya xwe zêdekiriye."





# Di demek kurt de xebatên girîng

***Navenda Şopdarên Rojê ev 8 mehe bê navber xebatên xwe berdewam dike. Li Navenda Şopdarên Rojê jin û ciwan bi hevre xebatê lê birêvedibin. Navendê heta niha gelek pirtûk bi zimanê Kurdî û Erebî werger kirine û dokumanter amade kirine.***







**Evîn YÛSIV/ Melek DEMÎRTAŞ**

Bi armanca piştrastkirina şoreşa Rojava û beûyerên wê, parastina van piştrastiyan ji windakirinê. Navenda Şobdarên Rojê ya çand û wêjeyî di 1'ê meha Çileya 2018'an de li bajarê Qamişlo hate vekirin. Ku ev navend di riya belgefîlm, nivîsnadina çîrok û romanên serpêhatiyên şoreşê de bûne, bûye mîna hafizeya dîrokê û lêvegerek jibû nivşên nû.
Di navendê de jin û ciwan bi hevre xebatê di meşînin, Navend ji sê beşên wekî(nivîskî, piştrastkirin û ragihandin)pêk tê. Ji bo ku em navend, xebat û çalakiyên wan ji nêzve nasbikin, Rojnameya Ronahî serdana nevendê kir û nerînên wan girtin.

### DÎROKA KURDAN JİNÛVE PİŞTRAST BİKİN

Endama Rêvebira Navenda Şobdarên Rojê Heyva Heyder Hesen da zanîn ku girînge şoreş Rojava bê piştrastkirin û belgekirin, bi taybet qada leşkerî ku di oxira parstina xak û azadiya gel de, gele keç û xort canê xwe fedakirin û bûne sembol. Û axaftina xwe wiha dom kir: "Dîroka kurdan di nav rûpelên dîroka cîhanê de nehatiya piştrastkirin, bi taybet dîroka jinê, heger hind belge ser kurdan hebe jî bi pênûsa dijmin hatiye nivîsandin. ji bo wê pêwîste ku em ji nûve bi pênûsa rastiyê van belgeyan sererast bikin û dîroka kurd a resen tijî tekoşîna leşkerî û gel a bêhmpa bi nivîsên xwe di her demê de zindî bikin; û ji bo wê jî kedek mezin pêwîst dike."

### DÎ DEMEK KURT DE XEBATEK ŞÎNBER


Di çarçoveya danesîna beşê navend û pirtûkan Heyva wiha got: "Beşa yekem nivîskî ye, sê jin tê de dixebitin û sê xoet pirtûkên wekî çîrok û romanên serpêhatî amaede dikin. Her wiha amedekirina pirtûkan ser belgeyên ku bi lêkolîn û roportaj bi kesên pispor di dîrok, wêjeya kurdî û dîmografiyê de dikin, di heman demê de sûd ji hind pirtûkên ku bi pênûsa kurdan hatiye nivîsandin digrin. Heya niha pirtûkên wekî "Şefeqa bi rûyêdin ku çîrokên şoreşê vedibêje Henan Reşko nivîsandiye, Serdaba Reş Ehmed Hemê ye naveroka wê ser DAIŞ û hovîtiya wan vedibêje û pirtûka sêyemîn jî Eyqona nemirî ji şoreşa kurdî ji berhemên Heyfa û Sena ne. Ev pirtûk bi taybet ser jinên kurd ji serdema mîsolojî û heya roja îro, ku jin di qada şer û civakê de jî pêşengtî û rêbertî kiriye vedibêje. Her wiha Ristem Resûl demografiya lêşkerî bi zimanê kurdî weşand. Pirtûk bi zimanê kurdî û Erbeî tê nivîsandin."

### EYQONA NEMİR PİŞTRASTKİRİNA DÎROKA JİNÊ YE

Rêvebira Navendê Sena Hacî jî bal kişand ser veşartina rola jin di dîrokê de û wiha got: "Pêwîste hemû mijarên girêdayî jin piştrast bikin, ji bo wê di nivîsên xwe de girîngî da rola jin di şoreşê de taybet di qada leşkerî û beriya wê çawabû. ku jin dinavbera 7 salên şorşê de gelek destkeftî bi destxistin û heya roja îro diparêzin û mezin dikin. Jin di du qadên girîng de tekoşîn û şer dike şerê li himberî hişmendiya kevneşop û kor û şerê çeteyên herî hov DAIŞ'ê bi hêz, vîn û bawerî kir û bûne sembola azadi yê. û Sena wiha domkir: "Girîngiya pirtûka "Eyqonên nemir di piştrastkirina pêvajoyên tekoşîna û berwxedaniya jinê, me gelek belge ser kesayetên jinên tekoşer û berxwedêr ji Bakûr, Başûr Rojhilat û Rojava yê Kurdistanê girtin dest, lê em dizanin ku hîn jî hene. Rastî da ku agahiyên rast kombikin em rastî zehmetiyan hatin, ji ber ku lêvegerên ku em agahiyên rast bigrin nebû, ji ber ku dîrok kurd û berwxedaniya wan ne hatiye piştrast kirin."

### DÎROAK JİNA TEKOŞER PİŞTRAST BİKİN

Sena Hacî da zanîn ku heya niha 23 şoreşên kurdistanê çêbûne, lê tekoşîna jinê di wan de nehatiye vegotin û wiha bi lêvkir: "Tevî ku herkes dizane bi saya piştgirtî û parastina jin ji herêmên wêre bû sedema serke ji pêşketin û serkeftina wê û şoreşê. Lê ev hemû berhemdayînê jinê bi sedên salan di dîrokê de hatin veşartin, ji bo wê jî yek ji armancama ji vê pirtûka bi navê "Eyqoneya nimir" ku em berwxedaniya kurd û jinê belge û piştrast bikin û vê dîroka ku bi hezarên salan veşartî ji raya giştî re derxînin. Her wiha wê ev pirtûk ji nivşên nû û herkesên dixazin dîroka tekoşîna jin û kurd a resen nasbike bibe lêvegerek."



## Li Ser Sopa Peyvan "Fileh"

**Sîpan ŞÎNDA**

Weke tê zanîn, piştî fermana dewleta Osmaniyan di 1915 ê de ya li ser filehan (Mesîhî) rakirî, hema bêje li bakûrê Kurdistanê û li Tirkiyê çi Erminî, Asûrî, Êzidî, Nastûrî ango kesên baweriyên wan ne Îslam be neman. Ez bawerim ew kesên xeyrî Mislim, yên ji fermana wêran felitîne mirov dikarî bi tiliyan bijimartiya! Piştî vê fermana malwêran gelik tişt hatine gotin û nivîsandin. Lêbelê hêj ji bo dermankirina vê birîna xedar xelefên ferman rakirine çi tişt nekirine. Mirov dikare gelik tiştan li ser vê mijarê bêje, lê emê li ser peyva "fileh" bisekinin.
Fileh, ji kes, kom, ango bawermendên Mesîhî re tê gotin. Gelo ev gotinek raste yan na? Koka peyva 'fileh' ji Erebî, ji peyva 'felh' tê. Fileh, ango felah, fellah, felahat. Çend wateyên vê peyvê hene. 1) Kesên cot, cotkariyê dikin. Ev wateya peyvê ya resen e. 2) Kesên li herdû dinya dilşad. 3) Kesên xeyrî Mislim. 4) Kesên ji nexweşiyê felitîn û gehiştîn firehiyê, rihetiyê, xweşiyê. Li gor min hege peyva 'fileh' ji bo kesên ji fermana 1915 an felitîne re bê gotin, di vê wateyê de bê bikaranîn di cih de ye! Her çend ev peyv tê van wateyan, lêbelê di nava civaka me de tenê ji bo kesên baweriya wan Mesîhî re tê bikaranîn. Dema fermana 1915 ê hatiye rakirin, di nava Kurdan de kesên bi wijdan derketine û xwe li hinek kesên baweriya wan Mesîhî kirine xweyî û ew parastine. Piştî dewleta Osmaniyan di şerê cîhanê yê yekem têk diçe û peymana Lozanê çêdibe, nû ew kesên Mesîhî yên ji fermanê felitîne, diçin li ser gundên xwe û ji nû ve jiyana xwe berdewam dikin. Lê mixabin ji ber kû di nava civaka Kurd de cehalet zêdeye, ev kesên Mesîhî her tim xwe li axa û mezinên herêmê digirin û jiyana xwe di bin sî ya wan de didomînin. Ji ber wê ev peyva 'fileh' ji di nava civakê de di wateyên cuda de hatiye şixwilandin. Ev peyv gelik caran di wateya biçûk kirin, kêm dîtin, heqaret, wêdetirîn, xwilam û xizmetkar û hwd de hatiye bikaranîn. Mînak, ji kesên kû hevsarê hespê bûkê digirtin re digotin 'filehê bûkê'! Mirov dikare gelik mînakên bi vî rengî bide. Mixabin cehaleta di nava civaka Kurd de ji xwe pirr zêde bû, bi sîr dana desthilatdaran ji ev tişt dihate rewa kirin. Bes Mesîhiyên li herêmê de dijiyan, gelik bawerî dabûn derdora xwe û wan bi civaka Kurdên Misilman re têkiliyên xurt danîne.
Ji ber vê dostanî û baweriyê di nava wan de peyvên xweştir û tu kes pê ne êşê ji hatine şixwilandin. Dema dostaniyek di nava kesên Misilman û Mesîhî de dihate danîn, ji hevdû re digotin 'tirbêt'. Tirbêt, ji bo dostanî, destebiratî û wekheviya di nava yekî Misilman û yekî Mesîhî de tê danîn re tê gotin. Dema ji hevdû re digotin tirbêt, bawerî û destebiratiya xwe didan nîşan. Ev tirbêtiya wan ji heya mirinê bû. Dîsa di nava civakê de kesên zana û xwedî hişmendiyeke pêşketî bûna, ji Mesîhiyan re digotin 'hosta'. Ji ber kû Mesîhiyên li herêmê hostayî dikirin û pirrên wan xwedî dezgeh û sinetkar bûn. Hina karê şala, hina karê necariyê, hina karê mêzer û hwd dikirin. Yanê hema bêje hemî sinetkar bûn. Ji ber wê kesên di nava civaka Kurdên Misilman de zana bûna, ji bona hirmet û rêz girtinê digotin Mesîhiyan 'hosta'.

## Ji bo pêşketina qabiliyeta zarokan guhdan pêwîste

**Ferîşte NEZÎR**

Bi armanca ku afrîner û berhemdarên çand û huner û werzîşê li gel şagirtan pêşbixin. Komîteya çalakiyên dibistanan yên çand û huner û werzîşê, navendên perwerdekirina şagirtan ser amûrêm mûzîk, şano, dîlan û werzîşê di bin sîwna Desteya perwerdeê ya Herêma Cizrê û bi alîkariya KPCD'ê beriya 4 mehan li bajarê Qamişlo ya milê Şerqê hati bû vekirin. Ku di navbera van mehan de ev şagirt ser gelek huneran hatine perwerdekirin, yek jê jî huneran wênesaziyê anjî) wênexêz e.
Girêdayî mijarê Mamosteya Wênesazê Leyla Xelaf diyar kir ku wênesazî ji beriya nivîs ango tîpan di şikeftan de bi zimanê ragihandinê re derketiye û Wênesazî çand û hunera civakan herdem zindî dihêle".

### 30 ÎAGİRTÎ PERWERDE DİKE

Mamosteya Huner ya Wênesaziyê Leyla Xelaf anî ziman ku ev du mehin perwerdeya xêzkirina wêneyan dide şagirtina û wiha got: "Bi armnaca ku zarok him xwedî li çand û him jî qabiliyeta wan jî pêş bikeve li dibistana Ilmaza Xelîl a milê şerqî perwerdeya xêzkikrina wêneya dide 30'î şagirtî. Temenê wan ji 9 heya 18 salî hene, di destpêka perwerdê de şagirtan ser rêbazên çawaniya xêzkirina wêneyan hîn kir, di meha duyemîn de ser karê destan wekî bi qaxez, macun, qaşilê qwîzan û alavên wekî qotiyên kola û avê yanî tiştên ku davêjin."

### SÛD JÎ HEMÛ ALAVAN DİGRİN

Leyla da zanîn ku ji alavên ne pêwîst sûd digrin û wiha dom kir: "Yanî jidêvila ku qaxez an jî ew alavana bavêjin û jîngehê qirêj bikin, ew şagirtana bi wan çi gul, tablo û ajalan û lîstokan çêdikin. wisa him fêr dibin, dilşad dibin û him jî jîngehê ji qirêjiyê diparêzin. Di heman demê di riya van perwerdeyan de hînî çawa ji alavên destê xwe sûd bigirin, ji wan gelek karên bedew bi destê zarokên hatine nîgarkirin, dê dipêşngehê de bêne pêşkêşkirin. Her wiha bi armanca hêdayînê min du pêşenghên wêne û karê destan ên zarokan li darxist, ku di riya van çalakiyan bi qîmeta berhemên xwe hisiyan."

### JÎ BO PÊŞKETİNA QABİLİYETA ZAROKAN GUHDAN PÊWÎSTE

yLeyla bal kişand ser guhdana zarokan û got: "Di her wext û zemanî de, lê bêgûman di dema îro de hê bihtir, guhdan û hînkirina zarokan erkekî herî giran û girîng dikeve ser milê mamosteyan û dibistana jiyanê, ev guhdan û hînkirin bi gelek rengan tê naskirin- çek ziman, werzîş, leystikên zarokan û xêzkirina wêneyan...hwd.
Hêjayî bi bîr xistinê ku di dawiya vê mehêde dê demsla xwendina 2018 û 2019'ê deriyê xwe ji xwendekaran re veke, bi rast hatina vê boneyê dê Komîteya çalakiyên dibistanan yên çand û huner û werzîşê, kû dibin sîwna Desteya perwerdê ya KPCD'ê Qamişlo şahî ji bo moral û hêzdayîna şagiratn li dibistana Ilmaza Xelîl lidarbixe, dê di şahiyê de ev şagirtên ku du mehin ser xêzkkirina wêneyan û karê destan xebatê xwe pêşkêş bikin."



# Hezar û 800 mamoste hatin perwerde kirin

**Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Tebqayê dewreya perwerdeyê ya ku beriya 2 mehan dabû destpêkirin, bi dawî kir. Komîteyê ji bo amadekirina mamosteyên Tebqa û gundewarên rojhilat û bakur ji bo hezar û 800 mamosteyan ji beşên cuda dewreya perwerdekirinê vekir.**

Di amadekariyên Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Tebqayê de ji bo pêşwazkirina sala perwerdeyê ya nû, hezar û 800 mamoste di ezmûnekê re hatin derbas kirin. Mamoste beriya 2 mehan tev li dewreyên perwerdeyê bûbûn.
Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a herêma Tebqayê dewreya perwerdeyê ya ku beriya 2 mehan dabû destpêkirin, bi dawî kir. Komîteyê ji bo amadekirina mamosteyên Tebqa û gundewarên rojhilat û bakur ji bo hezar û 800 mamosteyan ji beşên cuda dewreya perwerdekirinê vekir.
Armanca vê dewreyê, pêşxistina asta fikrî û zanistî ya mamosteyan, karînên wan di wanedayînê de û têgihiştina bi xwendekaran re û teşwîqkirina xwendekaran bû.
Di dewreyê de mamosteyan waneyên şêwazên wanedayînê, waneyên derûnî û bîrdozî dîtin ku ji aliyê 75 perwerdekarên Komîteya Perwerde û Fêrkirinê hatin dayîn.
Mamoste li 11 navendan bi vî awayî hatin belav kirin: Bajarê Tebqa 3 navend (Umer El-Mixtar, El-Qadisiye, Fayêz Mensûr), bajarokê El-Cirniyê 3 navend (El-Ciriniyê, El-Mehmûdlî, El-Remle) û 5 navend li gundewarên başûr (El-Mensûra, Hinêde, El-Sehil, El-Kesrat, Retla).
Hevseroka Yekitiya Mamosteyan a Tebqayê Hezar El-Derwîş diyar kir ku ji bo naskirina asta sûdgirtina mamosteyan ji dewreyê me nirxandinek dawî ji bo mamosteyan çêkir. Komîteya nirxandinê ji 5 endaman, hevserokên navendê, arşîv, 2 ji perwerdekaran pêk dihat.




Komîteya Perwerde û Fêrkirinê 2'yê Îlona vê salê wek destpêka sala perwerdeyê ya 2018-2019'an diyar kir…*ANHA*

## Her rojek bi salekê ye

Şîlan XOCE

Weke hemû beşên civakê zarok jî para xwe ji hovîtiya dagirkeriya dewleta Tirk girtin. Zarokên Efrînê yên ku li herêma Şehbayê dimînin bi xebatên hunerî, lîstik û dilpakiya xwe vê hovîtiyê vedibêjin.

### LÎSTOKÊN ME JÎ KUŞTIN!

Şevbîn Oso, zaroka ji gundê Qurtqulaq ê girêdayî navçeya Şera ku li kampa Serdem dimîne dagirkerî wiha rave kir: Rojane balafirên cengê ser me de difiriyan. Mal û gundên me rûxandin. Dibistanên me hilweşandin. Gelek zarok kuştin û koçber kirin. Şevbîn bi bîrî behsa lîstokên xwe kir û got: Pêlîstokên me jî kuştin. Em jî dixwazin nola hemû zarokên dunyayê bê tirs bijîn. Em ji Efrînê hez dikin. Hêviya min ew e ku di demeke kin de vegerim warê xwe û ji nû ve bi hogirên xwe re tevî lîstokên xwe bilîzim. Şevbîn Oso dawiyê de bi dengê xwe yê zelal strana Berxwedana Serdemê ji me got û hestên xwe bi gotinên stranê ji me re vegot.

### STUYÊ MIRÎŞKAN JÎ JÊKIRIN!

Zaroka yazdeh salî navê Evîn Hisên a ji gundê Çeqelê Cûmê yê girêdayî navçeya Cindirêsê jî got: `Min gelek bîriya Efrînê kiriye. Her rojek di ser me re diçe bi qasî salekê dirêj e. Çi dibe bila bibe, ez dixwazim bi pirtûk, heval, cîran û hogirên xwe re li ser axa Efrînê bijîm. Em ê ji nû ve dibistanên xwe ava bikin. Evîn jî mîna hemtemenên xwe talanî û hovîtiya dewleta dagirker a Tirkiyê ji bîr nekiriye û dibêje: Em ê li van deverên berxwedanê bi riya stranên xwe dagirkeriyê têk bibin. Li me zarokan ma be, wê dagirkerî biherife. Dawiyê de herdu zarokan bi van gotinan hestên xwe wergerandin: "Em nûpelên Efrînê, ji wan baxên evînê. Ji wan dibistanên me, banga me li cîhanê. Rûvî êrişî me dikin, warê me talan dikin. Kevok û mirîşkan jî, stuyê wan jêdikin. Dibistan wêran kirin, mal jî dûman kirin. Ka lîstokên zarokan, ji destê çûkan birin."





## 104 Şehîd hatin bibîranîn

Li Serêkaniyê şehîdên ku di mehên Gulan, Hezîran, Tîrmeh û Tebaxê yên salên cuda de li Bakurê Sûriyeyê û Rojava şehîd ketin, hatin bîranîn.

Saziya Malbatên Şehîdan a herêma Serêkaniyê bi bîranînekê, 104 şehîdên di mehên Gulan, Hezîran, Tîrmeh û Tebaxê ku di salên cuda de li Rojava û Bakurê Suriyê şehîd ketine, bi bîr anîn.
Bîranîn li hola şanoyê ya Navenda Çand û Hunerê ya Waşokanî ya Serêkaniyê pêk hat. Di bîranînê de malbatên şehîdan, şervanên YPG/YPJ'ê, saziyên Rêveberiya Xweser tev li bîranînê bûn. Di bîranînê de wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, alên YPG/YPJ'ê û wêneyên 104 şehîdan hatin daliqandin.
Merasîm bi rêzgirtinê dest pê kir û piştre axaftin hatin kirin. Li ser navê Meclîsa Malbatên Şehîdan Şêrîn Şêxê axivî. Şêrîn şehîdên şoreşa Kurdistanê bi bîr anîn, sersaxî ji malbatên 104 şehîdan re xwest û wiha got: "Ev ax bi xwîna şehîdan hatiye avdan. Em li ber bîranîna şehîdan bejna xwe ditewînin."
Li ser navê hêzên leşkerî Şahoz Kobanê axivî û xêrhatina malbatên şehîdan kir. Şahoz anî ziman ku şêrê azadiyê yê ku bi fîşeka 15 Tebaxê dest pê kir, îro li Rojava berdewam e. Şahoz bang li malbatên şehîdan kir ku bila baş bizanin ku dê her tim li ser rêya şehîdan bimeşin û wan qet ji bîr nekin.
Li ser navê Kongreya Star jî dayika Şehîd Şiyar Zelîxa Mislim axivî û bang li dayikên şehîdan kir ku bila rondikan nebarînin, zarokên wan şehîdên şeref û azadiyê ne, bila bi wan serbilind bin.
Piştî axaftinan malbatên şehîdan yek bi yek axivîn û li ser zarokên xwe helbest gotin.



Çare



## Windahî

Sîpan CAN

Dîsa windahî, ji nav me barkir û çû, dilên bi hezaran zîz û jar kir. Rûndikên dayîkên êzîdxanê ku hîn li ser zar û mindalên xwe zuhanebûne, ji nûde mîna kaniyên çiyayên Edûl û Derwîşan herikbar kir. Birînên ku hîna ne hatine girtin vekir. Dîmenên hovîtiya celadên sedsala bîst û yekemîn dîsa di ber çavên xwedê de derbas kir. Gotin ji wateya xwe derket, nivîs ji peyvan şerm dike û rûpel şîrove û wesfên te napejerîn e û dibêje xêz û rûpelên min têra te nakin, ancax dîrok te binvîse û bikaribe we mayînde bike. belê hûn in, yên ku sîh û neh salên xwe ji bo azadiya gelê heftê û çar fermanan bû sembola tekoşîn û fedekariyê.
Xwedawend li bermeber bejna we şerm dikin, ji ber ew dizanin bê çare ne û nikarin cîhana ku afirandine ser û bin hev bikin û yên çê û xirap ji hev derxînin. Ew xwedewand nizanîbûn ku wê hin mîna Egîd û Mamo Zekiyan bibin sembolên 15'ê Tebaxê û di mêjuya avakirina mirovahiya bê bext ya wan xwedewendan de bikevin dewsa wan û mirovahiyê ji nû de ava û bi wate bikin.
Helbet, şehadeta te ne tenê windahiye, felaket û keraset e, dilên gelek kurtêlxwar û sûxûran bi we şad dibe. ji dijmin û dagirkeran zêdetir kurmên dara me kêfxweş dibin. Lê; ew nizanin ku dawiya wan tê. Nizanin ku we bi hezaran nifş perwerde kirine û bi hezaran dil û cegera dayîkan qezenckirine. Ew nizanin bê, efsaneya ezemeta we di rûpelên dîrokê de bi tîpên zêrîn tê nivîsandin û ew bi xwe di sergoyên dîrokê de digevizin.
Erê Mamo, yê ku silavek dabe we jî şans û pîroziyeke, ji ber hemtayên we di dîroka tekoşîna rizgariya gelê kurd de nayên dîtin û dubarekirin. Tenê, nimûneyên mîna we dikarin li ser hespê Hedbanê siwar bibin û serkêşiya govenda azadiya kurdistan û kurdbuyînê bikin û bêjin " em ji bo welatê xwe şehîd bûn" dilşad be, hûn in, yê dikarin dilşadbin, ji ber we li pişta xwe bi hezaran şervan û şagirt amede kirine ku armanc û riya we berdewam bikin.
Bi vê windehiyê divê ku, her kesê xwe kurd dibîne helwest bide, di riya netewbûna kurd de bê deng nemîne, em bixwazin wendahiyên bi vî rengî dîsa nedin. Divê em xwe zelal bikin û yên xwediyê vê dozê xwe bikin yek û li dijî van komployan bikaribin bibin bend ku carek din dubare nebin. di serî de kurmên darê ji kokê de bê hilandin û duyem jî dijminên ku ji van sîstemên genî û qirêj pêk tên bi guhertina sîstema RojhilatNavîn wê rê li ber windahiyan bê girtin.
Mamo Zekî Şingalî hûnê her tim di bîr û wîjdanê me de kolandî bin.



# Avakirina JINWAR ber bi qedandinê ye

***Avakirina gundê jinan JINWAR berî bi du salan hat destpê kirin û êdî ber bi dawîbûnê ye. Li gund 30 mal hatine avakirin. Heta niha malbatek li gund hatiye bi cih kirin. Niha avakirina akademî û nexweşxaneyê jî berdewam dike.***

Melek DEMÎRTAŞ

Bi armanca avakirina avahiyeke taybetî bi jinan ji bo jiyanek xwezayî û azad, her wiha jin bi xweser bijî û xwe bi xwe rêve bibin, civakek demokratîk û ramanên azad, yanî ser rêgezên civaka Exlaq û polîtîk avabikin. Bi vê mebestê di 25'ê Mijdara 2016'an de 5 dezgehên jin wekî Kongra Star, Jinelojî, Desteya JIn, Jinên Şaredarî û Aboriya jin dest bi xebatê avakirina Gundê Jinwar kirin û hîn jî xebat berdewa me.
Wekî Rojnameya Ronahî xebatê avahiya gund dişopînin û ji bo naskirina bevajoya xebatê avakirina Gundê me serdana gund kir û Rêvebira vahiya gud diyar kir ku avahî ber bidawî ve diçe û dê li gorî dema hatiye pîlankirin bidaî bibe."

### HÎN AVAKİRİN BERDEWA ME

Ev nêzî salek û nivî ku di gunde xebatê avakirinê berdewam dike ku heye niha 30 xaniyên ser sê rengan normal, biçûk û qube bi kerpîçan çêdikin bi dawî bû, gulîstan, çayxane, nexweşxane, û ekademiya jinê jî ber bi dawî ve diçe, di heman demê de dibistana zarokan nû du ode hatine avakirin û navendeke dermankirina xwezayî tê avakirin, her wiha dukanek mîna markêtek ji bo peydakirina pêwîstiyên mal û jinê jî tê avakirin. Endama Rêvebiriya avakirina gundê Jinwar da zanîn ku hîn projeyên avakirina werşeyên dirûtin, karê destan û kargehên cûda hene, di hema demê de dê wê dermanxaneyek bi dermanên xwezayî çêbikin."

### HER TİŞT BI AFİRANDİNA DESTA NE

Di dema gera me ji gund re, çavên me li tevin û şêweya avakirina xaniyan û gund ket ku hemû bi destan û xwezayî tên çêkirin, xuya ye wê di gund de her tişt bi afirandina destan be. Eew xaniyên kelpîç yên ku ser sê şêweyan hatine avakirin 17 xaniyên mezin, 10 bi qûbe û 13 normal, ku xêniyê mezin heye 4 malabt jî dikarin bi cih bikin, li gorî malabtê û meziniya wê dimîne. Di hema demê de hin xanî bi rengê qûbê hatin avakirin, dema ku me ji berpirsê avahiyê pirskir çima qûbe wiha bersiv da û got: "Da ku ji tava (Roj) a dijwar biparêze û xanî hînik bimîne, her wiha jî di demasla çilde jî bervajî dike".




### DÊ HER TİŞT BI PÎVANÊN CİVAKA XWEZAYÎ BE

Rêvebira Gundê Jinwar bal kişand ser hind mercên derbasbûna wê û wiha got: "Mercên derbasbûna malabat û jinan gundê Jinwar wihaye "Girîngî bidin hevjînên şehîdan, jinên bi temen mezin û kes xwediyên wan tune û jinê ku temenê wan mezinbûye û nezwicîne, anjî keçên naxwazin bizewicin dikarin derbasbin, her wiha keç û jinê xwedî proje wekî çi di dibistan, nexweşxane, çandinî bixebitin û projeyên cûda hebin dikarin tevlî Jinwar bibin yanî li gorî pîvanên gundê xwezayî her jin çalak be, ji bo wê jin kengî derkevin bê merc dikarin derkevin ew azadin. Her wiha tekez kir ku piştî ku gund temamî xilas bû û şîneyên gund derbas bûn, ji bo aboriya gunde û xwetêrkirinê dê piranî ser çandinî û kedîkirina sewlan û mirîşkan be. Û karê destan, berhemên jin û projeyên koperatîfan li gorî gund be."
Dema mirov dibê je gunde bi xwezayî şînkayî û bexçe bala mirovan dikşîne, ji bo wê çavê me bi bexçeya gund ket ku rûbariya zeviyê çandiniyê 175 donim e wekî (Genim, nîsk û ceh diçînin û bexçe jî 35 donim e mîna darên fêkî û şînkahî diçînin."


### YEKEM JİN LÎ JINWAR BÎ CİHEBÛ

Di encam agerma ji gund re em rastî malbatek biçûk hatin ku di gunde hatiye bi cih kirin jin û sê zarokên wê Necah Hesen jinek Ereb ji Gundê Rawiya ya girêdayî Serê Kaniyê ku hevjînê wê di êrîşa çeteyên DAIŞ'ê de şehîd bû niha wekî jinek yekemîn li gûndê Jinwar bi cihbûye Necah Destpêkê sipasiya saziya malbata şehîdan û Gundê Jinwar kir û wiha got: "Hevjînê min di encama şerê çeteyên DAIŞ'ê de li Dêra Zorê şehîd bû û bavê hevjî minjî kuştin, DAIŞ mala me talan û wêrankiri. Piştre ez û zarokên xwe demekê li mala birayê xwe mam dema birayê min jî wefat kirin, hevjîna wî em derxistin û em bê mal mam. Lê di riya Saziya Malbatê Şahîdan de hatim gundê Jinwar û ev heftiyek bi azadî li vê civaka xwezayî jiyand ikim. Ez gelekî kêfxweşim ku li ku ez yekemîn jin li Gundê jinwar bicihbûme. Di heman demê de hemû pêdiviyên malabtî û kesayîtî ji mire pêşkêşkirin."

## Jin deyndarê azadiya rêber Apo ne

Şîlan XOCE





Jinên li kampa Berxwedan dimînin derbarê tecrîda girankirî ya li ser Rêberê gelên Kurdistanê Abdulah Ocalan de gotin: Dibe ku rêberê me fîzîkî dîl hatibe girtin, lê ramanên wî azad in. Rêberê ku jin azad kiriye wê bi têkoşîna jinê ya domdar jî azad bibe.

### BI ŞÎRÊ FELSEFEYA RÊBER APO ZAROK MEZIN DIBIN

Têkildarî mijarê jina bi navê Qedriye Menan Mustefa ku niştecîya kampa Berxwedan e got: Beriya ku Rêber APO hebe, jin hebisciyê çar dîwar bû. Mafê xwe yê jiyanê ji dest dabû. Rêber APO yekem fîlosof, zanyar û ramyarê ku azadiya jinê misoger kiriye ye. Qedriye tekez dike ku dewletên komploger dixwestin bi riya dîlgirtina Rêber APO vîna jinê lawaz bikin û ev tişt li gotinên xwe zêde kir: Berevajî armancên komplogeran, jina Kurd bû pêşengê têkoşîna jinên cîhanê. Jin bi girêdana xwe ya samîmî bi rêberê xwe re wê asta têkoşîna xwe bilind bike û dê serokê xwe jî rizgar bike. Jina Kurd îroj zarokên bi şîrê felsefeya Rêber APO mezin dikin. Ji bo têkbirina tecrîda girankirî ya ku dewleta faşîst a Tirkiyê li ser rêberê me ferz kiriye, em ê heya dawiyê têbikoşin û wefedarê Serok APO bin.

### RÊBER APO KILÎTA ÇARESERIYÊ YE

Meryem Fayîq Xelîl jî got: Jina Kurd li ser hîmên pîtoleya Rêber APO derbasî qonaxeke nû ya jiyanê bû. Jinê rastiya xwe nas kir û li cihê xwe yê xwezayî vegerî. Meryem destnîşan dike ku; raste Rêberê me dîl hatiye girtin, lê bi ramanên xwe yên derbarê azadiya jinê de zindî di nav me de ye.
Jinên Kampa Berxwedan di dawiyê de tekez kirin ku tenê Rêber APO dikare hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn çareser bike û ev tişt anîn ziman: Rêber APO xwedî keda mezin a têkoşîna azadiya jinê ye. Jinên Kurd û ên cîhanê dendarê Rêber APO ne. Ji ber vê yekê, em bang li hemû jinên cîhanê, saziyên navneteweyî û rêxistinên mafê mirovan dikin ku beşdarî têkoşîna jinê ya azadiya Rêber APO bibin û vê tecrîda faşîzma Tirk a bêbext li ser Rêber APO bişkînin.

## Komîteya Sulhê pirsgirêkên jinan çareser dike

Endama Komîteya Sulhê Şêxa Mehmûd da zanîn ku komîteya Sulhê ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan xwedî girîgiyeke mezin e.
Şêxa Mehmûd yek ji jinê ku piştî Şoreşa Rojava cihê xwe di nava rêveberiyê û di mala jinê ya Serêkaniyê de girtiye. Şêxa diyar kir ku avakirina Komîteya Sulhê girîngiyeke wê ya mezin di nav civakê de heye û bi taybet jî ji bo jinê."
Şêxa Mehmûd derbarê kar û xebata xwe ya Komîteya Sulhê de wiha got: "Karê me di Komîteya Sulhê de tê wateya çareserkirina gelek pirsgirêkan. Em li vir hemû pirsgirêkên jinan ji pevçûnên malbatî, pevçûna cîrantî bigire heta bi li ser du zewaciyê disekinin û ji bo ku ev pirsgirêk dernekevin dibin çareserî. Pirsgirêka tundiya li ser jinê ku ji hêla mêrve tê kirin û zewaca di temenê biçûk de çareser dikin. Ji ber ku di cavekê de bi çavekÎ biçûk li jinê tê nerîn, avakirina Komîteya Sulhê bû weke sened ji hemû jinan re."
Şêxayê, di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku avakirina Komîteya Sulhê girîngiyeke wê ya mezin heye ji bo jinê û bi taybetî jî ji bo jinên Ereb û dewam kir: "Heta niha jî gelek jin zehmetiyan ji hêla mêr ve dikşînin û bi taybetî jî jinên pêkhateyên Ereb."
Şêxa yê di dawiya gotinên xwe de bang li hemû jinan kir ku ji bo hemû pirsgirêkên xwe berê xwe bidin Komîteya Sulhê û pirsgirêkên xwe bi mala jinê re parve bikin…
*JINNEWS*



## Êdî wê kes nikaribê îradeya Êzidiyan bişkîne



Hevseroka Yekîtiya Êzidiyên Herêma Efrînê Suad Hiso diyar kir ku Erdogan û Iraqê di şexsê Zekî Şengalî de xwestin ku carek din kurdên Êzidî qir bikin û fermana 73'yan dubare bikin. Lê tu caran wê îrade û vîna kurdên Êzidî neyê şikandin."

Hevseroka yekîtiya Êzîdiyan ya Herêma Efrînê Suad Hiso li ser êrîşa balafirên şer yên dewleta Tirk ku di 15'ê Tebaxê de li dijî Şengalê pêk anî û di encamê de Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Zekî Şengalî de şehîd bû, axivî.
Suad di destpêka axaftina xwe de êrîş şermezar kir û anî zima ku êrîş di encama peymanên qirêj yên di navberê Erdogan û Ebadî de hagiye kirin.
Di berdewamiya axaftina xwe de Suad wiha got: "Ji ber ku Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Zekî Şengalî xwedî li Êzidiyan derdiket û hişt ku gelê Êzidî li Şengalê xwe bi rêxistin bikin, Erdogan û Ebadî di kesayeta Zekî Şengalî de xwestin ku Kurdên Êzidî qir bikin û êrîşên DAÎŞ'ê yên 3'yê Tebaxa 2014'an de li dijî Êzidiyan dewam bikin û fermana 75'an pêk bînin."
Suad, di berdewamiya axaftina xwe de bang li Êzidiyan kir li dijî van êrîşan rabin ser piyan, çalakiyan li darbixin û li hember dijminê mirovahiyê dewleta tirk ku bi salane êrîşî Êzîdiyan dike, li ber xwe bidin."
Hevseroka Yekîtiya Êzidiyên Herêma Efrînê Suad Hiso Di dawiyê de wiha got: "Ti caran hêvî û îradeya gelê Êzîdî naşikê, ji ber ku li ser fikir û Felsefeya Rêber Apo dimeşin. Heta dilopeke xwîn di canê me de hebe, em ê berxwedana xwe dewam bikin, tola şehîdên riya azadiyê hildin û rêberê xwe azad bikin."…*JINNEWS*

# Armanc Sûriyeke demokratîk û pir-rengî ye

***Serokê buroya Partiya Sûriya Pêşerojê li Helebê Mihemed Hac Mustefa diyar kir ku partiya wan ji ber pêwîstiya çareserkirina aloziya Sûriyê hatiye avakirin û da zanîn ku armanca wan avakirina Sûriyeke pir-rengî û demokratîk e. Hac Mustefa got, “Partiya me yekîtî û berjewendiyên gelên Sûriyê esas digire û yekbûna axa Sûriyê diparêze.”***

**Idrîs HENAN**

Serokê buroya Partiya Sûriya Pêşerojê li Helebê Mihemed Hac Mustefa diyar kir ku, sedema aloziya Sûriyê hişmendiya sîstema desthilat e û wiha got: “Armanca me avakirina Sûriyeke nû nenavendî, pir-rengî û demokratik e.”

### YEKBÛNA AXA SÛRIYÊ TEKEZ DIKE

Serokê buroya Partiya Sûriya Pêşerojê li Helebê Mihemed Hac Mustefa di destpêka nirxandina xwe de bal kişand li ser erkên Partiya Sûriyê ya Pêşerojê û got: “Partiya Sûriya Pêşerojê, ji bo pêkanîna guherîna demokratîk, rêbazê têkoşîna aştiyane hildibijêre. Li ser hîmên pir-rengî û azadî û demokratîk, yekbûna axa Sûriyê tekez dike.”

### PARTÎ HEWCEYEKE DÎROKÎ BÛ

Mustefa da zanîn ku ji bo çareseriya aloziya Sûriyê partiya wan



weke pêwîstiyekê hatiye avakirin û got, “armanca partiya me ew e ku şer û aloziya li Sûriyê bi dawî bike û Sûriyeke demokratîk û pir-rengî ava bike.”

### ALOZÎ XWE DISPÊRE ŞÊWEYÊ SÎSTEMA HEYÎ

Hac Mustefa têgîna nenavendiya demokratîk wiha pênase kir: “Nenavendiya demokratîk di çarçoveya cudatiya karê her sê rêveberiyên zagonsaz, birêvebirn û dadweriyê de tê destgirtin. Partiya Pêşerojê hewl dide bandora navendê li ser şaxan kêm bike û xweseriyên herêman li gorî destûra Sûriyeya nû biparêze.”

Mustefa da zanîn ku cewherê aloziya Sûriyê xwe dispêre naverok û şêweyên sîstema desthilat û got: “Ev hişmendiya despot bû sersebebê beralîkirina çandên dîtir ên Sûriyê û alozî bi xwe re gir kir. Venerîna tendirust a çareseriyê jî xwe dispêre hevbeşî, pir-rengî û qebûlkirina çandên dîtir. Nasnameya pir-rengî jî hewceyî avakirina Sûriyeke sivîl û veguherîna ber bi sîstema nenavendiya demokratîk û rêveberiya pir-rengî ya parlemantoyê ye. Bi vê şêweyê sîstema nû re, wê herêmên Sûriyê xwedî xweseriyeke zagonsaz, birêveberî û dadweriyeke ber fireh bin.”

### BERJEWENDIYA GELÊN SÛRIYEYÊ ESAS E

Mustefa destnîşan kir ku partiya Pêşerojê li ser hîmên wekheviyê têkîliyan bi hemû partiyên Sûriyeyî re ava dike û ev tişt anî ziman: “Bingeha têkîliyên me berjewendiya welêt û gelên Sûriyê ye. Ancax ev jî bi riya organîzekirin û pêşxistina têkîliyên partiyê bi partî, hêzên siyasî, çalakiyên civakî û rêxistinên civaka sivîl re li gorî prensîb, siyaset û armancên partiyê pêkan bin. Mustefe tekez dike ku di vê derbarê de gelek hevdîtin bi partiyên cuda yên Sûriyê re çêbûne û got: “Bi rêjeyeke cuda, hema bêje em li hemû parêzgehên Sûriyeyê cih digirin.”

### SIBEROJ WÊ BAŞTIR BE

Mustefa erkên şaxên Partiya Sûriyeya Pêşerojê jî wiha diyar dike: “Hemû şaxên me li gorî plansazî û bernameyek ku siyaset, prensîb û armancên partiyê rave dikin, têkoşîn dike. Li ser van bingehan her şaxek li gorî herêma ku lê, çalakiyên çandî, fikrî û siyasî li dar dixe. Armanc jî ew e ku em têgihiştina demokratîk û neteweyî nava hemû beşên gelên Sûriyeyê de belav bikin.”

Di dawiyê de Serokê şaxa Partiya Sûriyeya Pêşerojê li Helebê Mihemed Hac Mustefa got: “Gelek proje û bernameyên cuda li pêşberî me ne. Ji bo siberojeke baştir ji hemû nifşên Sûriyeya demokratîk, pir-rengî û nenavendî re, em ê di rojên pêş de, bi awayekî hê çalaktir plansazî û bernameyên xwe pêk bînin.”

## Rêveberiya xweser di çareseriyê de xwedî rol e

Ebdulselam Ehmed diyar kir ku Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Rojava hebûna xwe ya siyasî û leşkerî îsbat kir. Ehmed bi bîr xist ku dema behsa çareserkirina aloziya Sûriyê bê kirin, divê Rêveberiya Xweser neyê paşguhkirin.

Ji rêveberên Buroya Têkiliyên Giştî ya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Ebdulselam Ehmed destnîşan kir ku piştî Rêveberiya Xweser hat avakirin û şûnde hemû ol, pêkhate û neteweyan di nava xwe de dihewîne û hemû pêkhateyan bi hev re hevpeymana civakî ya Rêveberiya Xweser nivîsand.

Ehmed bi bîr xist ku bi saya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ewlehî û aramî li herêmên Rojava pêk hat û hemû komên çete DAIŞ ên ku hewl didan îradeya gelan têk bibin, hatin têk birin.

Ehmed bal kişand ser rola QSD`ê ya rizgarkirina piraniya Bakurê Sûriyê ji çeteyan û got li wan herêman meclisên herêmî û Rêveberiya Xweseriya Sivîl hatin îlankirin.

Ehmed girîngiya Rêveberiya Xweser ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê bi bîr xist û wiha got: ″Dema behsa çareserkirina aloziya Sûriyê were kirin, dive Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û Sivîl neyên paşguhkirin.″

Ebdulselam Ehmed di dawiya axaftina xwe de ev tiş anî ziman: ″Li herêmên di bin kontrola muxalefetê de, hemû projeyên wê têk çûn û





li wan herêman şerê mezhebî dest pê kir û gihişt asta şerê navxweyî. Lê li herêmên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk jiyana hevbeş a xwe dispêre qebûlkirina aliyê din pêk hat. Em hêvî dikin ku projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li tevahiya herêmên Sûriyê were bicihanîn.″…*ANHA*

## Bila Iraq helwesta xwe zelal bike

Koordînasyona Civaka Êzîdî bi daxuyaniyeke nivîskî êrîşa dewleta Tirk a li ser Şengalê şermezar kir û bang li Iraqê kir ku helwesta xwe ya li hember Êzîdiyan zelal bike. Koordînasyonê her wiha bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) kir ku li dijî êrîşên dewleta Tirk bêdeng nemîne û xwest, ku qada hewayî ji balafirên şer ên dagirker re were girtin.

### EV ÊRÎŞ DEWAMA FERMANÊ YE

Daxuyaniya Koordînasyona Civaka Êzîdî wiha ye:

“Wek tê zanîn li Şengalê roja 15-8-2018’an ji aliyê dewleta Tirk û hevkarên wê ve êrîşek nemerdane ya hewayî hat kirin. Di encamê de endamê me yê Koordînasyona Civaka Êzîdî hevrê û Mamê me Zekî Şengalî şehîd bû.

Hevrêyê me Zekî Şengalî ango Mam Zekî, bi minasebeta salvegera bîranîna şehîdên fermanê, ango bîranîna şehîdên komkujiya gundê Koço çûbû Şengalê. Bi vê armancê di roja salvegera komkujîya gundê Koço hatibû vexwendin. Êrîş, di dema vegerê ya gundê Koço de pêk hat.

Ev êrîşek plankirî bû. Dewleta Tirk û hevkarên xwe ev êrîş di rojek weke roja komkojî li ser civaka Êzîdî de pêk anî. Ji bo wê jî ev êrîş ji bo civaka me watedar e. Ev yek bi serê xwe armanca dewleta Tirk û hevkarên wê ya ji vê êrîşê radixe ber çavan.

### IRAQ, PDK Û DYA JÎ BERPIRS IN

Wek Koordînasyona Civaka Êzîdî, em ji vê êrîşa qirêj a ku pêk hatî, bi qasî dewleta Tirk, Iraq, PDK û DYA jî berpirsyar dibînin. Plana qetilkirina Mam Zekî Şengalî di çarçoveya planek hazir a qirêj de pêk hatiye. Ev êrîş ne êrîşek ji rêze ye. Li ser civaka Êzîdî dewamkirina siyaseta fermanê ye.

Pir vekiriye ev bûyer, di encama bername û xefikek piralî ya dewleta Tirk û hevkarên wê de pêk hatiye. Piştî çûyina Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî ya li Tirkiye yê, pêkhatina vê bûyerê cihê fikaran e. Rê dayina dewleta Iraq a vê êrîşê bi serê xwe Iraq xistiye bin berpirsîyartîyê. Em Koordînasyona Civaka Êzîdî vê helwestê, wek nîşaneya siyaseta dewleta Iraqê ya li dijî civaka Êzîdî dibînin.

### ‘NÊZÎKATIYA DEWLETA IRAQÊ YA LI ÊZÎDIYAN ÇIYE?’

Divê neyê jibîrkirin ku fermana 03-08-2014’an ya li ser civaka Êzîdî pêk hatî, wek dewlet Iraq berpirsyar bû. Civaka Êzîdî di nav sînorê Iraqê de dijî. Bi gotinek din Êzîdî hemwelatiyên Iraqê bûn. Di parastina civaka Êzîdî de Iraq berprsyar bû.

Lê mixabin; dewleta Iraqê bi vê erka xwe ranebû. Bi gotinek din Êzîdî terka fermanê û mirinê kirin. Li pêşberî vê yekê pir bi zehmet, êş û dilek şikestî be jî, bi hatina Iraqê ya li Şengalê civaka me bi hêvî pêşwazî kirîbû. Lê mixabin hin helwest ango siyaseta Iraqê birîna me kul kir û wek civak êşên me mezintir kirin. Di serîde li ser vê êrîşa li dijî civaka me pêk hatîye, em li bendê ne Iraq helwesta xwe bi awayekî zelal nîşan bide.

Em bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) û hemû saziyên navnetewî dikin ku li hemberî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk û hevalbendên wê bêdeng nemînin. Asimanên Şingalê ji balafirên dagirkeran re were qedexekirin. Em wek rê hevalên Mam Zekî emê tifaq û yekîtiya gelê xwe pêşbixin , xweseriya gelê xwe misoger bikin û tekoşîna xwe bilind bikin.”

## Şengal wê li dijî êrîşan têkoşînê berdewam bike



Umer Salih diyar kir ku armanca êrîşên dewleta Tirk ên li ser Şengalê, ew e ku nehêlin gelê Êzîdî azad bijî û xwe bi rêve bibe.

Têkildarî êrîşa dewleta Tirk a li ser Şengalê ku di encamê de Endamê Koordanîsyona Civaka Êzidî û Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Zekî Şengalî şehîd bû, Serokê Partiya Azadî û Demokrasiyê ya Êzidiyan axivî û diyar kir ji bo ku gelê Êzidî negihîje azadî û mafên xwe dewleta Tirk di nava êrîşan de ye.

Umer diyar kir êrîşa dewleta Tirk di salvegera êrîşa DAIŞ’ê ya li ser Şengalê de pêk hat got, “Ev jî tesaduf nîne û plankarî ye. Şengal wê li dijî van hemû êrîşan tekoşînê bike.”

Umer Salih destnîşan kir ku êrîşa li ser Şengalê di encama lihevkirina hikumeta Bexda û AKP’ê de pêk hatiye û wiha dewam kir, “piştî têkçûna DAIŞ’ê, ev êrîş ji bo şikandina vîna gelê Êzidî û tunekirina hebûna wî pêk hat.”

Umer Salih destnîşan kir ku êrîşên dewleta Tirk li ser Şengalê bi armanca têkbirina projeya azadî û bidestxistina mafên gelê Êzidî armanc dike. Umer wiha got: “Dewleta Tirk li dijî lidarxistina kongreya Kurdistanê ya netewî disekine, lê mixabin Partiya Demokratîk a Kurdistanê (PDK) destê xwe dike destê dewleta Tirk û li dijî desketiyên me tevdigerin.”

Serokê Partiya Azadî û Demokrasiyê ya Êzidiyan Umer Salih di dawiyê de diyar kir ku bêdengiya hikumeta başûr tê wateya ku ew jî hevkarê êrîşên li ser Şengalê ne.



# Wê kêfa wan di ber wan de bimîne

***Komîteya Rêveber a PKK’ê li ser êrîşa hewayî ya li Şengalê ku dewleta Tirk 15’ê Tebaxê li dijî endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Zekî Şengalî kir, daxuyaniyek da. PKK’ê wiha got, “Kujerên faşîst-qirker ji ber ku şervanekî wiha yê azadiyê kuştine, çiqasî ji wan tê bila kêf bikin. Di demeke gelekî nêz de wê ev kêf û xweşiya wan di ber wan de bimîne. Şagirtên Mam Zekî, milîtanên Apocî yên qewîn wê hesabê ji kujerên faşîst qat bi qat bipirsin.”***

Komîteya Rêveber a PKK’ê destnîşan kir ku sûîqesta dewleta Tirk a li Şengalê di encama hevdîtin û bazareke mezin de pêk hatiye û got, “Di demeke pir nêz de wê kêfa wan di ber wan de bimîne.”

Komîteya Rêveber a PKK’ê li ser êrîşa hewayî ya li Şengalê ku dewleta Tirk 15’ê Tebaxê li Şengalê li dijî endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Zekî Şengalî kir, daxuyaniyeke nivîskî weşand. PKK’ê bi taybetî bal kşand ser hevdîtinên navbera Enqere, Hewlêr, Bexda û Washîngtonê de kir û got, “Hevdîtin û bazara navbera van hêzan ji bo kuştina Zekî Şengalî bû.” PKK’ê wiha dewam kir: “Şagirtên Mam Zekî, milîtanên Apoyî yên qewîn wê hesabê kiryarên kujerên faşîst qat bi qat ji wan bipirsin.”

Daxuyaniya Komîteya Rêveber a PKK’ê wiha ye:

“Ji ber êrîşa hewayî ya hêzên artêşa TC a faşîst-qirker ku roja 15’ê Tebaxê li xaka qedîm a Kurdistanê li Şengalê kir, Mamê civaka Kurd a Êzidî Mam Zekî, şervanê azadiyê yê leheng ê gelê Kurdistanê, milîtanê kedkar ê tevgera me ya azadiyê, endamê Koordînasyona Civaka Êzidî hevrê Zekî Şengalî (Îsmaîl Ozden) şehîd bû.

Êrîşa li dijî Zekî Şengalî êrîşa li dijî hebûna Kurdên me yên Êzidî û rêveberiya xweseriya demokratîk e. Êrîşa 15’ê Tebaxê ya li Şengalê ku bi balafirên şer ên TC’ê hate kirin, di heman demê de êrîşa li dijî yekîtiya demokratîk û xwişk-biratiya gelên Şengalê ye. Êrîşek li dijî hebûn û azadiya gelê Kurdistanê ye. Bi êrîşeke wiha xwestin pêşî li demokratîkbûna



Iraqê û Başûrê Kurdistanê bigirin. Ev êrîş dewama êrîşa DAÎŞ’ê ya 3’ê Tebaxa 2014’an û êrîşa TC a 24’ê Nîsana 2017’an e. Beşek ji êrîşên hêzên TC ên faşîst ên li dijî Efrîn û Bradostê ne. Ya ku faşîzma DAÎŞ’ê di 3’ê Tebaxa 2014’an de nekarî bike û jê nehat, faşîzma AKP-MHP’ê roja 15’ê Tebaxê xwest bike.

### HEVDÎTIN Û BAZARÊN MEZIN LI SER HATIN KIRIN

Di vir de lazim e ev pirs bi vekirî were pirsîn: Hêzên TC ên faşîst-qirker bi kîjan maf û hiqûqê her carê bi balafirên şer, tank û topan bomberdûmanê li Şengalê û xaka Başûrê Kurdistanê dike? Gelo Iraq dewletek e û li Bexdayê hikumetek heye yan na? Eger hebe, wê çaxê balafirên şer ên TC bi daxwaz û destûra vê dewlet û hikumetê bombeyan li Şengalê dibarîne? Rêveberiya li Başûrê Kurdistanê ya li Hewlêrê ji bo vê bomberdûmanê çi dibêje? Qada hewayî ya Iraqê bi dehan salan e ji aliyê DYA’yê ve tê parastin. Wê wextê, gelo balafirên şer ên TC’ê bi destûr û daxwaza DYA’yê bombeyan li Şengalê dibarînin? Eşkere û li pêş çavan e; serdana rojek berê ya Serokwezîrê Iraqê li Enqereyê, hevdîtinên îstîxbaratê yên navbera MÎT û îstîxbaratên PDK û YNK’ê, hevdîtinên generalekî DYA’yî yên hefteyek berê li Enqereyê pêk anîn, hemû ji bo vê bûn! Ji bo kuştina Zekî Şengalî ev demeke dirêj e di navbera van hêzan de hevdîtin û bazarî hatiye kirin!

### KÊFA WAN WÊ DI BER WAN DE BIMÎNE

Kujerên faşîst-qirker ji ber ku şervanekî wiha yê azadiyê kuştine, çiqasî ji wan tê bila kêf bikin, bila bikin qareqar. Di demeke gelekî nêz de wê ev kêf û xweşiya wan di ber wan de bimîne. Di serî de jin û ciwan, gelê Kurdistanê bi taybetî civaka me ya Êzidî çawa ku faşîzma DAÎŞ’ê temirand, wê bi rêya têkoşîna xwe ya azadiyê, faşîzma AKP-MHP’ê jî bitemirîne. Weke şagirtên Mam Zekî, weke milîtanên Apoyî yên qewîn wê hesabê kiryarên kujerên faşîst qat bi qat ji wan bipirsin.”

## MSD bi rûspiyên Ereban re civiya



Nûnerên MSD’ê bi armanca nirxandina hevdîtina bi hêzên rejîma Sûriyê re bi rûspî û şêxên Ereban re civiyan.

Meclîsa Sûriya Demokratîk (MSD) li Kobanê bi armanca nirxandina hevdîtina bi hêzên rejîma Sûriyê re bi rûspî û şêxên Ereban re civiyan. Di civîna nêzî Pira Qerqozak a nêzî Çemê Firatê hate kirin de rûspiyên herêma Firatê, Endamê Konseya Hevserokatiya MSD’ê Hesen Mihemed Elî û Hevserokê Meclîsa Sivîl a Reqayê Abdûllah El-Mihbaş tevlîbûn.

Endamê Desteya Siyasî yê MSD’ê Hesen Mihemed hemû mijarên ku di hevdîtinên bi rêjîmê re hate nîqaşkirin ji beşdaran vegot û diyar kir ku ew hevdîtin negihiştin asta lihevkirinê. Hesen destnîşan kir ku MSD’ê hewl didin bi rêjîmê re destpêkê, ji bo derxistina dewletên dagirker ji xaka Sûriyeyê li hev bikin û piştre aloziyê bi rêya dansûtandinên netewî beyî mudexeleyên derve çareser bikin.

Hevserokê Meclîsa Sivîl a Reqayê Abdullah El-Mihbaş jî got: “Yekgirtina pêkahetyên herêmê tiştek ne nû ye. Eger em vegerin dîrokê em ê bibînin ku hemû pêkhate beyî ku ti pirsgirêk derkeve bi hev re jiyane. Siyasetên dewletên cîran li ser belavkirina fîtineyan di nav bera gelên herêmê de xwe birêxistin dike.”

## Çalakiya ciwanan li deriyê Sêmalkayê bi dawî bû



Çalakiya konvendanê yên ciwanên Rojava – Bakurê Sûriyê li ber deriyê Sêmalkayê bi daxuyaniyekê bi dawî bû.

Rêxistinên ciwanan ên Rojava û Bakurê Sûriyê 24‘ê Tîrmehê bi armanca şermezarkirina êrîşên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê, her wiha şermezkrina nêzîkatiyên PDK‘ê ku destûr neda ciwanan ku derbasî Başûr bibin û pişgiriya çalakiyên ciwanan bikin, çalakiya konvedanê li deriyê Sêmalkayê destpêkirin.

Çalakî roja 16’ê Tebaxê bi dawî bû, bi sedan endamên saziyên sivîl û leşkerî, nûnerên partiyên siyasî serdana çalakgeran kir û piştgiriya xwe ya bi çalakiyê re anîn ziman.

Çalakî bi merasîmeke leşkerî ji aliyê endamên Yekîtiya Ciwanên Rojava ve dest pê kir.

Endamê Koordînasyona YCR‘ê Akif Mustefa axivî û êrîşên dewleta tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê, êrîşa dawî ya li ser Şengalê û bêdengiya PDK‘ê şermezar kir.

Mustefa bang li rêxistinên Kurd kir Kongreya Netewî ya Kurdistanê bêyî beşdarkirina PDK‘ê li dar bixin û got, “PDK‘ê xeta îxanetê temsîl dike.”

Koma Botan a girêdayî Tevgera Çand û Hunerê jî stran gotin beşdaran jî li ber stranan govend gerandin.

Axaftina dawî ya çalakiyê ji aliyê Rêvebera Yekîtiya Jina Ciwan Şehnaz Zagros ve hate kirin.

Şehnaz got,”Wekî ciwan em êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê û îxaneta PDK‘ê şermezar dikin.”

Şehnaz destnîşan kir ku ew ê çalakiyên xwe bi rihê Berxwedana Serdemê bi dawî bikin û xeta şehîdan berdewam bikin.



## Li hember îxanetê serî hildin

**Idrîs HENAN**

Tevgera azadî ya gelên Kurdistanê yek ji tevgerên nûjen ku paşxaneya têkoşîn û xebata gelê Kurd û tevahî gelên Kurdistanê di pêvajoyên berxwedaniya dîrokî de dihewîne ye.

Tevgera azadî ya Kurdistanê her terzê têkoşîna xwe spartiye têgînên edalet, wekheviya herdu zayendan, dostaniya bi hawîrdorê re û azadiya jinê. Ji ber vê jî tevgereke têkneçûyî ye.

Bi hezaran kadroyên wê yên pêşeng li hemû dunyayê fena hewariyan rojê digihînin şevê. Li gorî rêgezên exlaq-polîtîk yên felsefeya afrînerê wê Abdulah Ocalan û rêhevalên wî, di her zeman û mekanî de dilebitin.

Di encama têkoşîn û berxwedaneke dîrokî ya vê tevgerê û sempatiyên wê de, îro di Kurdistan û nav civaka Kurd de bûye rêxistineke milyonî. Ev jî ji xwe ber nehatiye. Ne jî encama hinek propagandeyên zer û rizî nola hinek tevgerên dîtir e. Eger wisa bûya, wê ji rojên destpêkê ve tevger têkbiçûya û ne digiha roja me ya îro ku bûye malê mirovahiyê. Helbet mezinbûyîna vê tevgerê rasterast girêdayî senteza Ocalan û pêşengên wê ye. Di pêvajoya dîrokî ya tevgerên şoreşger li dunyayê, ti hereketeke wisa di rojên zayînê de kadroyên wê yên pêşeng şehîd ketine tune ye. Ji salên damezirandinê bigire û heya îro were, hemû kêliyên vê tevgerê çîrokên berxwedaniyê ne. Berxwedaniya herî gewre jî li gorî sazûmankarê vê tevgerê Rêber Ocalan, li hemberî îxaneta hundirîn bû. Kesên ku dîroka vê tevgerê dinasin, pir bi hêsanî dizanin ku li Ero û Şemdinlî li hemberî kê têkoşîn dihat meşandin. Kî beriya dijmin bi xwe li hemberî zayîna tevgereke şoreşger disekinî? Li Ero û Şemdinlî li hemberî bê îradebûyînê û îxaneta dîrokî şerê rasteqîn a rizgariyê dest pê kirbû. Wê çaxê li Kurdistanê bi taybet piştî têkçûna bi dehan serhildanên Kurdan, êdî hêviyên rizgariyê jî li Agiriyê hatibûn definkirin. Di encama êrîşên şênber û razber ên domdar de, gelê me hatibû keviya tunebûnê. Ji xwe di aliyê çandî de rastî asîmîlasyon û qirkirina fîzîkî a bê navber hatibû. Çiqas kadroyên civakî, aqilmend û hizirînên azad an di zîndanan de dihatin tesfiyekirin an jî bi riya rêxistina istixbaratê dihatin qetilkirin. Ev hemû zilma dewleta dîktator-faşîst, ger ne bi desteka ajanan bûye ne pêkan bû bigiha vê astê. Wê misoger têkoşîna gelê Kurd jî bigiha statoyeke pêş. Lê mixabin, her birîna Kurd xwînê ji derbên îxanetê diherikîne. Tevî ku tevgera azadî ya Kurdistanê her banga yekîtiya neteweyî û li hemberî dagirkeriyê têkoşîna havpar dike, lê hîna jî nûkerên Kurd nikarin vê kirasê li xwe kirine bêxin. Bi rêbazên rezîl û bê exlaq heya dawiyê xizmeta celadên xwe dikin.

Mam Zekî Şengalî jî, nola gelek hemriyên xwe di encama serpêhatiyeke wisa a civakeke bindest de, bi komkujiya hewayî ya dewleta faşîst a Tirkiyê şehîd ket. Diyare li kêleka hikûmeta Îraq, PDK û DAY tiliya ajantiya Kurd a kirêt careke din heye. Hilbijartina dem û mekan ne tesaduf bû. Ango her dijminê Kurd di rojên dîrokî de rêbazên komkujiyê li hemberî gelê Kurd şuxilandiye. Hemû dunya jî dizane ku dewleta Tirk a ku 58 rojan li ber sînorên Efrînê diziriya, bê kurtêlxwar û ajanan, hêza wê ya pêkanîna oparasyoneke wisa nîne. Ji bo rê li ber komkujiyên muhtemel bê girtin, pêwîste demildest li hemberî vê sinifa ajan û îxanetcî gel û tevgera azadiyê serî hilde. Ger îxanet ji kokê ve neyê qelandin, her em ê rûbirûyî komkujiyên wisa xemgîn bin.